Çima Ev Hêrişên Hovane Li Ser Bedirxanîyan

Hesen Silêvanî

Mixabin , ku di kongirê Perwerdeyî yê Hevlerê de,li rojên 22- 24- Gulana-2007 de,hêrişeka dijwar, bi rengekî jehrawî, û plan bo kêşay ,li ser malbata Bedirxaniyan, ser ji nu hate kirin.Ev malbata dilsoz û xemxorên kurdînî yê û zimanê Kurdî yê paqij û şirîn. Kî berpirse ji vê tawana li bin alaya Kurdistanê,û li paytextê Kurdistanê rûday?? Erê bi çi maf wezareta perwerda Kurdistanê qebol kiriye ew koma nivîsînên bi jehrê reşandî, li jêr navê _ Zimanî Standardî kurdî û Elfubêyî Standardî Kurdî - komele wutarêk – ku di bineret de dijî kirmancî yê û malbata Bedirxaniyanin ??Kê rê xweşkirî ye ev jehre ho lêkday di navbera endamên kongireyê Perwerde yî de belav bit??kî vî mafî didit nivîskarê Ji xwe razî- Ferhad Şakelî -husa bi pêxwasî, bê rêzî bêjit:

((Le naw kurd de kes hêndî binemaley Bedirxan dilsozî bîr û bawer û îdyolokî yî Etatork nebû. Ewan eger `î be rewalet dijî Turkîya bûn ,belam le rastî da nakokîyan tenya le ser destelat bû. Celadet û Kamiran Bedirxan le hemo jiyanî de hewlî eweyan de da lasayî yî Etatork bikene we û zorîş le dilewe sersamî kesayetî bîrkirdinewey Etatork bûn.)) perê 10

Ew bi vê bêbextî yê bi tinî razî ne bûye , berdewamî yê didit gotina xwe û dibeje:

((Celadet û Kamiran deyanwîst ewey ke le siyaset da dorandûyane le ziman û ferheng da we destî bênine we.Binemaley Bedirxan her diway rûxanî mîrnişînî Botan le Estembûl we le Kirîta we le çend cêyekî dîke jiyan , belam hemîşe pêwendîyan le gel destgakanî împeryalîstîda, betaybet destgakanî casûsî hebû we û karyan bo kirdûn.Emeş hîc seyr nîye katê Ke dezanin ser`awey îdyolokî yî Etatork û Bedirxanîyekan her yek ser`aweye û herdû yan le yek kanî jehrawîyan xwardûte we)).Perê 11

Ev hêrişa hovane ya nivîserî di mêşkê xwe yê Nesax de vehandî û cêkirî , sexmeratî hindêye ku ev binemale pêşengên rewşenbîrî û zimanê kurdî bûyne ,û şun tilîyîn wan û berhemên zindî li pişt xwe, ji xurtên kurdan rehêlayne,nexasim ku Mîr Celadet Bedirxan xwedî yê hizra danana Elfabêya latînîye bo zimanê kurdî,jibo yek girtina zimanê kurdî li paşe rojê,cunke ew jîr û hoşmend bû û zanayekî zimanevanî bû. Ev hêrişên tamsar û bê binyat, dê her hebin ji alî yî nesax u mirovên mejî hişk u girtî ewên ji ber pên xwe wê vetir çu dî nabînin.Eznizanim eve ci girîye li ser elfebêya erebî,û keltora îslamî ya ku herdem çu rêz bo milletê Kurd negirtin, û kîmya û xerdel û siyanîd ji hejî me dîtîn, û bi şadî li me reşandîn û em bere v mirnê ajotîn!! Binemala Bedirxanîyan her dê mînin cihê rêzgirtina milletê Kurd ,ji ber wê mêjû ya paqija bo me hêlayn,û yên ne razê ,bila li pey awazên erebî binalin û binalin !!

hasanslevani@yahoo.com